Mewlana/Melayê Cizîrî û Dîwana wî ya hunerşah Beş -3-

Ji nivîsîna: Emîn Narozî

Xwendin û Zanîna Cizîrî
Usatadê hunera ristin û honanê Cizîrî jî mîna pirên zana û alimên serdema xwe li Medreseyên Kurdistanê û yên rojhilata navîn hemî zanîn û şarezahiyên pêwîst yên wê serdemê xwenidne û bi taybetî di rêzimana erebî û hunerê edebiyata wî de baş perwerde bûye. Herweha ji bilî ilm û zanînên pîşeyî yên mîna nehw û serf (rêziman), munazere, mentiq, kelam, fiqih, hedîs, şerî´et, usûl, ´eqaid, tefsîr, felekiyat, hendese, hisab, fizîk, û yên din wî di zanîna beyan, me´anî, i´caz, rewanbêjî û suxenweriyê de jî xwe qenc gihandiye û ji bilî erebî ew serwextê bi zimanê farisî, tirkî (osmanî) û zimanê xwe yê kurdî bûye.

Ji bilî vanên jorî ew li ser tesewwif û felsefê jî gelek xebitîye û li gor naveroka Dîwanê, wî xwe li ser dîrok, usûl ul- fiqih, stêrnasî û estetîkê jî qenc gihîştandiye.
Ew ji bo perwerdehiya van ilmên jorîn û gelekên din jî çawa li jor jî bihurî, weke adetê hemî zana û xwendekarên kurdan li gelek xwendegehên Kurdistanê (Cizîr, Diyarbekir, Hekarî, Îmadiye) û çendekên welatên cîran jî mîna Iraq û Şamê û Misr û Îranê jî geriyaye û piştî qedandina xwendina xwe jî li Farqîn, Amed (Diyarbekir) ku li gor Ezeddîn Mustefa Resûl û Celadet Bedirxanî bireke pir ji honraweyên xwe hingê nivîsîye, li Heskîfê (Hesenkeyfê) li medreseya mîrekên eyyûbî û paşiyê jî li Cizîra Botan li Medreseya Sor ya mîrekên Botan dersdarî kiriye û di van zanînên navbihurî de gelek zana û muderris (mamoste/ustad) derxisitine û muntehî/mentehî rakirin[13]

Li vê derê ji bo hinek taybetmendiyên **MedreseyaSor** belkî pêwîstî bi danenasîneke kurt hebe. Ya rastî ew bi serê xwe newaziş û xarîqeyek e ku hima bi çavpêketina wê bi tenê, Dîwana Mewlana Cizîrî bi hemî naveroka xwe ya xurt û heya ber dev dagirtî tê ber çavên mirovî.

Medreseya Sor bi kunbeta ku gora Melê, ya Mîr Xan Şerefê IIem, Mîr Emadeddînê hevpesindarê Melê di gel yên çend mîrekên Cizîrê yên din di bin de ne, xwedî cudahiyeke xweser e ku min di tu kunbetên camî û medereseyên din de nedîtiye. Lewra qubba ser gorên navdayî ku bi Medreseya Sor ve ye ber meqlûb û serobino ye, yanî qeware û valehiya kunbetê bervajî û ber bi jêr ve ye, ne mîna yên din e ku qubba wan bi jor ve ye û ji nav ve qewartiye.

Herweha di hawîrdorê hewşa medreseyê bi xwe de jî hicrikên piçûk ji bo xwendin û xebatê hene, lê tiştê balkêş ew e ku di her yek ji van hicrikan de jî quncikekî cida heyeku hew cihê kesekî tê de heye. Çawadixwiyê ew çilekêşgeh/xelwenişîngeh bûne ku xelîfe û zahidan di dema silûkê de tê de

çilên xwe kişandine, herweke ku Melê jî di gelek cihên Dîwana xwe de behsa wan kiriye.

Deriyekî piçûk ji hicrikê diçe çilegehê û bergazeke/zereqeyeke (paceyeke piçûk weke mezxelekê) jî li pêş di dîwarê derve de heye. Ji vê jî diyar dibe ku li wê medreseyê ji bilî ders û xwendinê xelîfeyên terîqetê û zahidan jî tê de emel kiriye û li gor normê tesewif û terîqeta hingê hatine perwerde kirin. Bi gotineke din Medreseya Sor çawa medreseya xwendin û zanînê bûye herweha di heman demê de tekye û warê gihîştandina zahid û mitesewifan bûye jî.

Astrolojî/felekiyat/stêrnasî di Dîwana Cizîrî de
Weke ku ji xwendevanên Dîwana Cizîrî ve jî xwiya ye Melê di zanîna stêrnasiyê de gelekî serwext bûye û di gelek şi´rên xwe de ew bi şarezayî xebitandiye û di dem û rewşên cihê cihê de gerr û dewra çerxa felekê û herheft rojgarên çerxê hem bi navên erebî yên felekiyatê û hem jî bi navên îranî-kurdî daye nasîn û bi kar aniye.

Herweha wî gerr û dewrana rojgar û cûreyên stêran di çerxa felekê de û ketina wan ya bircên esman di gel pêwendiyên wan bi deng û awaz û ahengên alav û meqamên muzîkê re jî di gelek honraweyên xwe de destnîşan kirine. Ji xwe wî navên gelek aheng û meqamên mûzîkê jî di şi´rên xwe de di gel alavên muzîkê yên curbecur yên heya serdema xwe bi nav kirine û pê re jî kîjan ji wan enstrumentan bi kîjan aheng û meqamî re, di kîjan wextê salê de gava roj û rojgar di kîjan bircê de bin li ser rawestiyaye û di honraweyên xwe de destnîşan kiriye.
Nimûne:

"*Newaya mitrib û çengê fîxan avête xerçengê*
Were saqî heya kengê neşoyin dil ji vê jengê"

Yanî dema roj di birca kêvjalê de ye ku navbera 21-hezîranê û 22 tîrmehê ye dengbêj bi awaza çengê (harpê) re û bi ahenga/meqamê newayî sirûd û stiran gotin heya ku dengê wî giha ber birca xerçengê. Çawa ku di wê serdemê de li rojhilata navîn di wî wextê salê de xelk ji bo şewbêrkan/şevbihêrkan li qahwe û meyxaneyên baxçe û bostanên bilind û li ser banê wan diciviya, honrawe dixwend û stran û lawik û lawje digot heya awaz û dengê wan digiha ber birca xerçengê/kêvjalê.

Ji xwe ji bilî ku Mewlana Cizîrî di van risteyên jêrî de hêmanên alem û gerdûnê nîşan dide herweha çawa N. Doru[14] jî di wê baweriyê de ye, weha dixwiyê ku Cizîrî di heman demê de xwestiye bi van risteyan 12 birc û heft çerx û felekên esmanan û rojgarên di wan de jî destnîşan bike:

Çar ´unsur in çar teb´et in vêkra bi mîzan vêk ketin
Bi hevra muxalifsîret in der sûretê şexsiyye da

Hetta bi mîzan çar esil bi hevra nebin cem´ û wesl

Cisman ji hev nabin fesil bazû ji bazû şeq neda

Çar ummehat in sê benat her bêqerar in bêtebat
Pir ´işq û meyl in iltifat d`vê taze deyrê kuhne da

Û herweha ew navên wan jî li gorî cih û rewşê bi aheng û alavên mûzîkê re yeko yeko diyar dike: yanî 12 /perde/aheng/meqamên mûzîkê, 12 alavên mûzîkê, 12 bircên esman/felek/çerxê û 7 rojgar + 5 komstêrên navdar ku pêkve dibin 12 (rojgar û stêr) di her heft çerxan de: 12+12+12+12. Mela van yeko yeko bi hevahengiya 12 destgahên/meqamên mûzîkê yên ku ji dozde alavên cihê derdikevin û li gor ku her yek ji wan bi kîjan birca felekê re li hev dike, di risteyên cihê de honaye.

Gelek mumkin e ku kesên di zanista stêrnasiyê de serwext bin, dikaribin dema honan û nivîsîna riste û şi´rên Melê jî bi hisabê felekiyat û qayideyên wê derxin holê.

12 Bircên esmanan/çerxan/felekan:

Birc		derece	hêman	Kalite	Rojgara piştgir, Çerx/Felek
♈	Beran	1°–30°	Agir	Şareza/rewşenbîr	Behram/Spehrî/Merîx/Mars, 5em
♉	Ga	31°–60°	Erd	Saxlem/qayim	Gelawêj/Nahîd/Zuhre/Venus /, 3em
♊	Cêwî	61°–90°	Hewa	Guhêrbar	Tîr/Utarid/ ´Etarid/Merkur, 2em
♋	Kêvjal	91°–120°	Av	Şareza/rewşenbîr	Heyv/Hîv/Qemer, 1em
♌	Şêr	121°–150°	Agir	Qayim/saxlem	Roj/Şems/Xwirşîd, 4em
♍	Sinbul	151°–180°	Erd	Guhêrbar	Tîr/Utarid/ Merkur, 2em
♎	Mêzîn	181°–210°	Hewa	Şareza/rewşenbîr	Gelavêj/Nahîd/Zuhre/Venus, 3em

♏	Dûpişk	211°–240°	Av	Saxlem/qayim	Behram/Merîx û Pluton/Mars û Pluto, 5em
♐	Kevan	241°–270°	Agir	Guhêrbar	Bercîs/Muşterî/ Jupiter, 6em
♑	Nêrî	271°–300°	Erd	Şareza/rewşenbîr	Kîwan/Keywan /Zuhel/ Saturn, 7em
♒	Dewl	301°–330°	Hewa	Saxlem/biryardar	Kîwan/Zuhel/Saturn/Uranus, 7em
♓	Masî/Hût	331°–360°	Av	Guhêrbar	Bercîs//Muşterî/Jupiter,Neptun 6em

1. **Birca Beran/Berx** (**Hemel**) 21/3-19/4, (rojgar: **Behram**/Merîx/Mars, alavên muzîkê**ney** û **nay**: , aheng: **sema**):

Heyheya reqs û semaya te çi xweş bestiye çerx
*Ku di **bircê** bi sema tête li ser destê xwe **Berx***

Dengê wê heyheya te ya xweş ya di kêf û şahiya reqs û govenda ayînî de welê lê kir ku berx/beran jî di birca xwe de li ser destê xwe li ber ahenga semayê bireqse û bê govenda semayî.[15]

Mey ku biçit saxerê di destê wê dilberê
*Sondê bi Xaliq dixwim roj e di **birca Hemel***

Ez bi Kirdigarê payeberztirîn sond dixwim ku gava piyaleya şerabê bi destê dildarê bê dagirtin hingê ew şerab dibe weke Roja geş ya xweş ya biharê ku hingê ew bi awaza ney û nayê re bi aheng û perdeya semayî dadikeve birca berxê/beranî.

2. **Birca Ga/Gaw** (sewr) 20/4-20/5, (rojgar: **Gelawêj**/Zuhre/Venus; alav: **ney** û **çeng**, meqam: **zengûle** û **gerdanî**):

Herdu qewsên te ji qudret ne ji Yeng
Jê bi mîzan bireşînin me xedeng
Biderin sîne bi serpence peleng
Romê pişt dit ʽecemî bête fireng
Lê ne wek waqiʽeya **Gêw** û Peşeng
Hilbitin qenc-i ji nêv ateşê ceng
Tên suwaşê hebeş û nûbî û zeng
Tu dizanî çi neheng in çi neheng

Veke le'lan tu ji ser şekkerê teng
Ku j' murada te bûyîn pêt û pereng
Mestê cewra te me bê bade û beng
Bê te cana li me 'alem bûye teng
Ji cefaya te nema qet li me reng
Tu dizanî çi dibêjit **ney** û **çeng**
Ji çi peyweste dinalin seradeng
Me dixwînin qed û bejna te yî şeng
Nêrgizên mest ê binaz û neyireng
Lê tu Tûba we ezê xeste yî leng
Çi bikim feyde ku êvar e dereng
Mutriban da nekevin çengê ji çeng
Da nedit perdeyê ayîneyê **zeng**
Ku ji çenga me binalit **xerçeng**
Wek Melayî bi hezar reng û aheng
Bi fixan bêt û ji ber sed ferseng
Çi xeber dim ji dilê te y` wekî seng
Dikujî 'aşiqê miskîn bi tefeng

Nekirî terkê tu vê kafiriyê
Dînberê horîmisalê zeriyê
Nazikê neyşekerê surperiyê

Çawa ku dixwiyê Melê "Gêw" hem ji bo pahlewanê dîrokî yê efsaneyî "Gêwê Guhderz" bi kar aniye û hem jî "Gaw"a ku bi farisî navê birca "Sewr": yanî ya "Ga:" ye bi formê kurdî tewandiye da du maneyên berbiçav ji hev cuda, lê di bingehê xwe de ji hêla mezinahiya bûyerê ve nêzî hev, diyar bike û herweha hinerê xwe yê suxenwerî yê i´cazê ku di gelek risteyên xwe de pê dipesine, nîşan bide. Lê dû re jî birca kêvjalê daye pey ku ji xwe du meh piştî birca ga roj dikeve wê.

[Ji xwe gava mirov qenc li raveya berfireh ya risteyên jorîn jî hûr dibe ev mebest jê diyar dibe:] Ey dildar ji birûyên te yê mîna kevanan ku ne ji sazkariya welatê Yengêlê ji destkariyadesthilatiya perwerdigarî ye, tîrên dijwar bi kêş û bi rêkûpêk direşînin dilê me û bi penceyê pilng yê dirinde dilê me yê birîndar ji sînga me derdixin û datînin ser kefa destê xwe.

Lê ev cenga ku bi êrîşa van sipahên pir pêk tê jî ne mîna bûyer û cenga navbera du serdarên mezin yên îranî Gêw û Peşeng e, lê belê bi dijwarî, bi xesar û ziyanê xwe di ser wê re ye. Çunkî ji bilî ku ev şer ji nav gurriya agirê cengeke dijwar ya kambax derketiye û alav daye, di ser re jî biskên porê reş ên kagul, enî û yên din jî mîna sipaha hebeşî, nûbî û zenciyan haha ye êrîş dikin tên alîkariya cengê û şerê me dikin. Ji xwe tu jî dizanî ey dildar ev sipahên êrîşkar xwedî çi hesp û hûtên behrî yên xurt û çi tîmsahên (nehengên) deryayî yên mezin yê dijwar in, ji ber vê jî ji kerema xwe re lêvên xwe yên lalî û sor ji ser wî devê teng yê şêrîn rake û bi zar û zimanekî şêrîn ji me re gotinên xweş bibêje û me bi sozê nêzîkbûn û gihîştina cem xwe şad bike.

Lewra ji ber negihîştina viyana xwe dilê me ji te bûye gurrî û bizotekî agir ku alav jê diçe û em ji ber tadeyî û azara evîna te bêşerab û babûng û afyonê serxweş û bêhiş bûne û ji ber dûriya ji te jî tu xweşî û hêsanîû çu reng jî li me nemaye, ya rastî ji xwe cana min bê te cihan jî li me teng bûye û tu tahma wê ji me re nemaye.

Ey evîndar ma tu dizanî ku alavên mûzîkê yên mîna ney û çengê bi awaz û naxmeyê xwe çi dibêjin û ji bo çi dengbêj herdem li pey hev bi dengê bilnd distirên û gazî dikin? Erê ew pê gazî me dikin û me vedixwînin dîdara bejina te ya rast ya hilkişiyayî û bala teya şepalî rind û herweha şabûna bi çavên nêrgizî yên şêrîn û nazdar yên efsûnkar û neyreng. Lê ax ka li kû ye ew gihîştin? Ma dê çawa bibe, tu bi xwe dara Tubayê ya xweziyan ya li esmanê jorîn û ez jî nexweşekî qels yê perîşan û seqetekî qop yê kulek im [li vê erda ku sembola birca gêw (ga) ye]; ma di vî wextê dereng û vî temenê derbasbûyî de ev fersenda dîtinê û şabûnê ji min re tê û ezê êdî çi fêde û sûd ji vê dîtinê wergirim.

Lê belê digel vê jî divê evîndar jî mîna sazbend û dengbêjan bêhêvî nebin û cehd û xebata xwe bernedin da neynika dilê wan zengarî nebe, çavên wan tarî nebin û birca kêvjalê ji ber qarîn û zarîna wan li esmanê jorîn nenale [û ew nalîna wan jî negihê erdê cem birca ga].[16]

3. **Birca Cêwî** (Cewza): 21/5-21/6, (rojgar: **Tîr**/ ´Utarid/ Merkur; alav: **ney**, aheng: **newa**):

Newaya *mitrib û* ***nayê*** *fîxan avête* ***cewzayê***
Fe ya heyya bi kasatin we ya heyya bi tasatî

Dema ku roj di birca Cêwî ya navbera 21/gulanê û 21/hezîranê de bû, fîxan û nalîn bi dengê stiranbêjî re di gel awaza neyê û bi ahenga newayê re bilind bûn heya gihan ber birca Cêwî ya di çerxa duyemîn de. Ey meyger ji kerema xwe re tu bi lez û bez bi tas û kaseyan şerabê bi me bigihîne da em sedemê wan fîxan û nalînan û wan awazan bi çavên serê xwe bibînin.

4. **Birca Kêvjalê** (xerçengê): 22/6-22/7, (rojgar:**Heyv**/ Hîv/Qemer; alav: **çeng**, aheng: **newa**):

Newaya mutrib û çengê fîxan avête **xerçengê**
Were saqî heta kengê neşoyîn dil ji vê jengê
Heyata dil meya baqî binoşîn da bi muştaqî
Ela ya eyyuh`es-saqî edir ke`sen we nawil ha

Dema ku roj di birca kêvjalê de bû ku navbera 21-hezîranê û 22 tîrmehê ye, Deng û awazên dengbêj bi yê çengê re di ahenga/meqamê newa de bilind bû heya giha ber birca kêvjalê ya ber perê esmanan. Ey meyger her di wê demê de tu jî were me bi şeraba xwe ya nemir (baqî) av bide û dilê

me yê mirî bi evîna xwedayî bişo û sax bike, da em wê şeraba evîna baqî ji dil û can vexwin û dilê xwe pê xweş û şad bikin û bigihên jiyana nemir. Ma xwene qey em ê vî dilê gunehkar û qirêj yê zengarî heya kengê neşon û di vê kirêtî û gemarê de bihêlin: ″Ey meyger fermo van şûşeyên tije şeraba sermedî bigerîne û bi destê me bigihîne".

5. **Birca Şêr** (Esed): 23/7-22/8, (rojgar: **Roj**/Şems/Xwirşîd; alav: **çeng**, aheng: **rast, uşşaq**):

*Perwaneyên sotîkebed dilber ji ber **birca Esed***
Tîr dan ji reştûzên semed lew têk ji xwînê neqqişîn

Em mîna wê xecxecoka/mizgînoka kezebşewitî ne ku dildarê ji bijangên xwe yên reş yên kilkirî yên semedanî û eniya xwe ya giç ya bilind a mîna birca şêr tîr avêtin me ta ku ji ber wan derban hemî endamên laşê me bi xwînê neqişîn û lewitîn.

6. **BircaSinbul**: 23/8-22/9, (rojgar:**Tîr**/´Utarid/ Merkur, alav: **ney**, aheng: **zengûle**):

Sinbulan seywan li dêmê taze kir
*Afitab îro di **birca Sinbul** e*

Sinbulên biskan û yên kagula ser eniyê bi awayekî wisa bedew yê bêhempa li dor wî rûyê rojîn hale dan û bûne xelek ku êdî wan dêman mîna roja di birca sinbulê de şewq û şemal dida û tîrêj ji wan diçûn.

7. **BircaMêzînê** (terazûyê): 23/9-22/10, (rojgar: **Gelavêj**/Nahîd/Zuhre/Venus, alav: **ney** û **çeng** aheng: **zengûle**, **gerdanî** û **rast**):

Senemê ji qewsê ebrû du hilalên new numandin
*Du keman li **burcê mîzan** bi xezeb li min kişandin*

Dildara senemîn herdu kevanên birûyên xwe mîna heyva dasûkî ya nû ya zirav têlbend kir û ew hilkişandin ser eniya mîna birca terazuyê û ji herdu kevanên birûyan awirên tûj yên mîna sertîran bi awazên ney û çengê re bi meqamê rast reşandin dilê min.

8. **Birca Dûpişk** (Eqreb): 23/10-22/11, (**Behram**/Merîx/Mars/Pluton, alav: **´ud**, aheng: **huseynî**):

Bomawer û şîrînlebê wê xûb û nûrînxebxebê
*Bedra di **Birca ‛eqrebê** kengê ji ber perdê derê*

Ez nizanin gelo ew dildara bêhngulav ya lêvşêrîn û xebxebrewşen ku rû jî mîna heyva çardeşevî ya di birca dûpişkê de û di nav wan biskên gulang û kagulên xwar yên badayî de ye, dê kengê ji ber perdê derê [û bi sehera

sibê re me bi awaza ´udê û bi aheng û perdeyên curbecur mîna huseynî û yên din şad bike].

9. **Birca Kevan** (qews): 23/11-21/12, (rojgar: **Bercîs**/Muşterî/Jupiter, alav: **´ûd**, aheng: **rehawî**):

*Wey spêde j' **bircê qews** ebrû numandin mahê new*
Xweş ji qewsê ebrûyan vê ra kişandin mahê new

Ji birca kevanî ya ser eniyê wêneyê birûyên mîna heyva nû zirav û kevankî û weke spêdeyê bi rohnî diyar kirin û xetatan jî bi wan birûyên kevankî re bi awayekî qenc yê xweşik bi awaza udê û bi meqamê rehawî re wêneyên heyva nû jî li ser rû kişandin.

10. **Birca Nêrî** (cedy): 22/12-20/1, (rojgar: **Kîwan**/Zuhel/Saturn, alav: **çeng**, aheng: **sema**)

*Di pabûsa semensayê mi **nêrî** bejn û balayê*
"Le'ellî eblux ul-esbabe esbab es-semewatî"

Di dema ramîsana nigê dildara weke yasemînê nazik ya xweşik de min xwe ji mezinahiya wê re tewand û bi hêviya ku ez bigihêm rê û dirbên rastî yên cihên bilind û payeyên pêşwaziyê, min bi dengê çengê û naxmeyên di meqamê sema de li spehîtiya wê bejn û bala şepal ya bilind nihêrî û qenc bala xwe da xwoşewistiyên wê.
Li vê derê ji peyva "***nêrî***" hem lêkera "***nêrîn***" û hem jî birca nêrî hatiye amanc kirin da bi alîkariya birca nêriyî hilkişe rê û dirbên esmanan û çerxên tê de.

11. **Birca Dewl**/delw/xerab, 21/1-19/2, (rojgar: **Kîwan**/Zuhel/Saturn/Uranus, alav: **ney** û **nay**, aheng: **sema´î**):

*Tû şerabê bi **xerabê** bi nehingan de demê*
Dê kîfayet bi çi rengî me bikin kûze û tas

Ey dost ger tu evîndarên weke tîmsah û şêrên deryayê bi şerabê av bidî, da ew pê xurt bibin û xwe li ber tade û renca evînê ragirin, bi dewlên mezin bide wan ne bi sewîl û tasên piçûk, çunkî ew kezebşewitî ne, kelewaca nava wan bi amanên piçûk yên weke kûz û tasan sar nabe û heya ku nebe jî ew nikarin li awaza ney û nayê ya di ahenga sema´î de guhdarî bikin û tê bigihên.

12. **Birca Masî** (neheng/hût), 20/2-20/3, (rojgar: Neptûn/Neptun, alav: **ney** û **çang**, meqam: ´**uşşaq**):

Bi evînê melek û çerx û felek têne sema
*Rewşen in têk-i bi mihrê ji sema ta bi **semek***

Hemî melaîket û çerx û felek tev di gerîneka evînê de direqisin û ji esmanê jorîn heya bigihê deryaya cihê masiyan gerdûn giş pêk ve bi gelemperî çi diyar çi derûnî û hemî heyî (afirandî) çi terr çi hişk, çi rewan çi rawestiyayî bi nûra evînê rewşen û rohnî bûne û li dor xala evîna rastî digerin û li ser qutbê evîna rebbanî xwe radigirin û bi bandora evîna zatê Xwedê digel awaza ney û çengê ya di meqamê uşşaq de direwin û tev digerin.[17]

Mûsîk, desgah/aheng/meqam û alavên Mûzîkê di Dîwanê de:
Desgah/aheng/meqam:

Newa:
Newaya *mutrib û çengê fîxan avête* ***xerçengê***
Were saqî heta kengê neşoyîn dil ji vê jengê
Heyata dil meya baqî binoşîn da bi muştaqî
"Ela ya eyyuh`es-saqî edir ke`sen we nawil ha"
(Ji bo maneyê binêre li jor li xala birca kêvjalê)

Ageh/yekgeh:
Çendî dinê bit her hebî ‛alem di ber hukmê te bî
Herçî divê te her we bî lebsê te kîmxe w xare bî
Dayim bi remz û ‛işwe bî şubhet gula her xunçe bî
Wî buxçeyê xar tê nebî **ageh** ji **‛uşşaqên** xwe bî
Çeşmek li ehwalê me bî derheq me lê bêperde bî
Saxer medam pir bade bî pirşefqe û xweşme‛de bî
Bihtir bi rehm û şefqe bî b`şîrê te da perwa nebî
Mexmûrê çehvên şehle bî sotîne narê firqetê

Ey dildar ez hêvîdar im ku heya dinya hebe tu jî hertim hebî, cihan hemî di bin desthilatatê de be û li gor dazwaziya te be. Herweha cil û bergên li ser te ji hevrîşimê tenik î giranbiha û hevrîşimê pêlpêlîyî hêja bin û herdem tu bi nîşan, bi naz û delalî, nazik û kubar û li pêşber hempayên xwe serbilind bî. Tu mîna guleke bijkoj ya nevekirî spehî û destnedayî bî û dirî û sitrîn di baxçeyê rindiya te de tunebin da tu ji tade û azarê wan paristî bî. Bi vê re jî tu ji hemî rewş (û ahenga) evîndarên xwe (ya yekgah) agahdar bî, çavên te li ser wan be, wan jibîr nekî, paşguh nekî û çavekî te jî li ser rewş û ahenga me dildaran be, lê di gel vê jî ji bo me tu bê perdeyeke ahengxwan bî û şepaliya xwe ji me veneşêrî.

Bila piyaleya şeraba te ya şadîmanî û dilxweşiyê timî tije û bi serî be, tu li hemberî me dilsoz, ji me re dilovan, beşerxweş û devliken bî û dilovaniya

te ji me re ji ya herkesî bêhtir be da em ji awirên çavên te yên weke şûran bêperwa û bêfikar bin û çavên te yên xezalî jî herdem mest û xumarî bin da me efsûn bikin, lewra bi rastî agir û şewata cudahî û dûriyê dilê me peritandiye û kezeba me biraştiye.

Sêgah/sîgah:
Li l-lah were saqî bi du caman me ciwan ke
*Mutrib bi defê ra bide **sêgah** û **şebabê***

Ey meyger tu bi Xwedê kî were du piyale ji şeraba jiyandêr ku pîran can dike û caniya kalan li wan vedigerîne bide me û me ji nû ve ciwan bike. Ey hunermendê dengbêj tu li defê xe û aheng û awzên sêgah bide bilûrê da coş û xiroş rabe, kêf û şahî geş bibe û piyale bên gerandin.[18]

Sema´/sima´î/sema´î/sema:
*Dê bişaret bi işaret ji neyê bête **sima**`*
Tu ji nayê di sima´ê bike bawer meke behs

Ey evîndar dê nîşan û îşaretên mizgîniya gihaştina cem dildarê ji dengê muzîka neyê ya di meqamê sema´î de bê sehkirin; ji ber wê jî tu ji wî dengê civata muzîkê bawer û dilbicîh be û qala rêyeke erêkirinê ya din meke, çunkî ev îşaret bi tenê têra dilbicîhkirinê dike.

Rast:
Heyîv bû ew di zulmatê dixwim sondê bi ayatê
*Ku nûrê da semawatê esed hat **rastê** mîzanê*
*Qemer hat **rastê** perwînan ji bo xemlê şemal înan*
Me nêrgiz dîn di nesrînan di nêv baxê gulistanê

Ez bi bi ayetan sond dixwim ku ew heyva taritiyê gava rohniya xwe da esmanan hingê awazeke meqamê rast ji birca şêr derket û bilind bû heya giha birca mêzînê, her di wê gavê de ew heyv jî li gor wî meqamê rast li ber şewqa perwînê xeml û şemalek da xwe û ew der ewqas rohnî kir ku di baxçeyê gulan de nêrgiz û nesrîn çirisîn û reng vedan.

Dil dixwînit zulf û xalan dêm û balayên ji nûr
Her bi qanûn mujdeya xeybê ji nayê rast û çep

Dil zilf û xalên ser dêm û balaya nûrîn vedixwîne û qanûn jî di gel neyê bi meqamê rast mizgînî dide ku dê ji xeybê rast û çep deng were.

Zuhre û ´iqda Sureyyayê di şerqê keşşifîn
Leylet ul-qedrê ji mexrib perde dayê rast û çep

Gava ew dildara mîna bercîsê digel gerdena weke Surreyayê (komika Sêwiyan) ji rojhilat ve xwiya bû hingê ji hêla rojava ve bi niyeta şeva Qedrê awaza dengbêj ji perdeya meqamê rast rast û çep bilind bû.

İsfehan:
Cohtê hebeşan bi terfet il-´eyn
Anî qederek ji Espehan/Esfehan bac

Herdu çavên dildarê yên mîna laşê hebeşî reş di demek pir kurt de ku bi qasî niqîna çavekî bû bi hêza rindiya wan çavên ku mîna ahenga isfehanî xurt in, dest danî ser bajarê Îsfehanê û tibabek bac jê anî.

Gerdenî (´iqd):
*Zuhre û ´**iqda** Sureyya keşşifî bûn ew di şerq*
Sayeya bextê me dayê ma li ser perde w niqab

Stêra gelavêj û gerdaniya perwînê ji rojhilat ve avêtin, lê bextê min yê reş bû sî û perde li ser wan û ew niximandin ta ku awaza wan ya meqamê gerdenî ji binî birrî.

Koçek/Kuçak (çengî di vî meqamî de lê dixe):
Fehmê raz er bikirî wer bibihî mujdeyê saz
***Çengî** bêperde dibêjit ne ney û nayê bi deng*

Ey evîndar ger te bivê razên zanista evînê û nihêniyên pîşeyê hezkirinê fêhm bikî fermo were civata mûzîka çengiyê da tu ji awazên hemî alavên mûzîkê di ahenga kuçak de mizgîniya raz û penhanan bibînî. Çunkî **çengî** bê ahenga xwe ya kuçakê jî bi **çengê** ji te re raz û nihêniyên ku ji awaza "nay û ney"ê nayê bihîstin, dibêje.

´Uşşaq:
Di iqlîmê suxen mîr im di şi'rê de cehangîr im
*"We ye'lu mewkib el-'**uşşaqi** e'lamî we rayatî*

Bêguman ez mîrê welatê xweşbêjan û yê herêma rewanbêj û xweşaxêvan im û di pîşeyê honraweyî û honana şi´r û qesîdeyan de cihangîr im û gava karwanê koma evîndaran digel awazên bi aheng û meqamê ´uşşaq ber bi hizûra pîroz ya bexşandinê ve diçe hingê alaya min bi ser ya wan dikeve û

bandrola min jî li pêşiya wan rewan dibe.

Zengole/zengûle/zeng:
Ku işaret bi bişaret bidirit nexmeyê ***çeng***
Ji rûyê ayîneyê dil biretin ***perdeyêzeng***

Gava alavê muzîkê yê harpê bi awaza xwe ya di meqamê zengûle de mizgîniya pêkanîna mirada evîndarî bide hingê dê neynika dil rohnî û zelal bibe û pê re jî dê ew zenga ku bûye weke perdeyekê li ser û nahêle dil bigihê zanîna xwedayî, paqij bibe û ji ser rabe.

Reha/Rehawî/rehawend:
Ji wê zulfê ji wê bendê reha bim lê ji peywendê
Siyehçeşmê spîzendê te sohtim şubhetê findê
Şubih şem' û şemal im ez ji ber hubba te lal im ez
Ze'îf im wek hilal im ez sifetgoyîn dikalim ez

Ez ji benda qayim ya wê biska ku dildarê dest û nigê min mehkem bi xelekên wê ve girêdabûn çiqas ku xelasiya jê zehmet bû jî, [dîsa ez bi alîkariya ahenga rehawî] filitîm. Lê belê ma qey felata ji te heye ey dildara çavreş ya zendspî, na bi rastî nîne çunkî te ez bi arê evîna xwe şewitandim û laşê min jî ji ber wî agirî weke mom û şimayê heliya û ji ber êşa evîna te mîna şimayê zermihî, lê digel vê jî ez ji ber dildariya te lal bûme nikarim gilî û gazinên xwe jî bikim. Herweha laşê min jî ji ber hezkirina te qels û lewaz bûye û pişta min jî fena heyva nûderketî xwar û zirav bûye, bûye weke dasûkekê ku ji ber vê jî ez mîna pepûkê herşev ji êvarê haya serê sibê natebitim û dikim nalîn û zarîn û her sibe bi bilbulê bax û bostanan re ku li ser gul û kulîlkan dixwîne, jî axîn û oxîna min e.

Humayûn (meqamê lorîna dayikên kurdan):
Nefesek bê te me naçî ne dijîn bê te demek
Ji te hat emrê ***humayûn*** *te we me´mûr-i kirîn*

Kêşana yek hilm û bêhneke bi tenê ku em dikêşin jî bê hebûn û viyana te ji me nayê û em bê te ne dişên wê bidin û ne jî bistînin, çawa ku em yek kêlîkeke bi tenê jî bê te nikarin bijîn. Ji xwe fermana siltaniyê ya ji bo vê yekê jî di meqamê humayûn yê lorîna dayikan de ji bal te ve hatiye dayin û te em weha pê erkdar kirine.[19]

Alavên muzîkê:

Bilûr (şebab):
Li l-lah were saqî bi du caman me ciwan ke
*Mutrib bi defê ra bide **sêgah** û **şebabê***
(Ji bo maneyê bnr. li jor li xala meqamê sêgah)

Çeng (arpa/harpa niha):
*Ku işaret bi bişaret bidirit nexmeyê **çeng***
*Ji rûyê ayîneyê dil biretin perdeyê **zeng***
(Ji bo maneyê bnr. li jor li xala meqamê zengole)

Fehmê raz er bikirî wer bibihî mujdeyê saz
Çengî bêperde dibêjit ne ney û nayê bi deng
(Ji bo maneyê bnr. li jor li xala meqamê kuçak)

Def (dahol/tebil):
Mey hate fincana sedef, kes dê vexwit îro bi xef
*Saqî bi çeng û nay û **def** ferfûriya mehtab-i da*

Piyaleya sedef bi şerabê hat dagirtin û badegêr jî ew bi dengê çeng, ney û defê re li civatê gerand, ka gelo kes heye rahêle vê badeya di vê cama ferfûrî de ku weke ya qiralê Çînê rohnî dide û diçirise, bi ser xwe dake û vexwe? Na herê, kes nake lewra yê ku vê bike barekî giran dide ser milê xwe ku daxwaziya şahê mezin e.

Canê Melê rûha Melê nûra ji qudret nuqte lê
*Remzek nihîn da min welê nalî ji ber wek nay û **def***

Can û rihê Melê dîtina wî rûyê geş e ku ji hêza xwedayî xalên reş lê ne û bi yek nîşaneke nihênî nalîneke weke ya nayê û tingîneke weke ya defê ji min anî.

Erxenûn:
*Nûra ji qudret lê du nûn jê ra dinalin **erxenûn***
Wer ayeta ´işqê bixûn xweşnusxeyek mestûr e dil

Ji ber evîna wê eniya geş û rewşen ya dildarê ku du birûyên kevankî yên fena du nûnên bermeqlûb li ser hatine kêşan, dilên evîndaran weke nalîna erxenûnê lê dide . Ey dost bi lez were ayeta evînê û sembola ku li ser rûyê wî dilî hatiye nivîsîn, bixwîne û bibîne ka ew çi naveroka nusxeyeke çak û nameyeke spehî û bedew ya evîndariyê ye.

Muxnî:
Ney û muxnî me hemraz in di remza ayîne came
Li min mehrem def û saz in didin bêperde peyxamê
Dinalin kewkeb û bazin hezar rengê di ilhamê

(Herdu alavên mûzîkê] Ney û muxnî hevsirrên me ne û piyaleya me ya ayineyî jî dirûvên def û saza xwemalî ku name û peyama evînê bêaheng û perde didin, nîşan dide û bi wan re jî bazin û guharên rengstêr bi hezar awayî dinalin û sirûşa perwerdigarî pêşkêş dikin.

Nay û Ney:
*Remz û razên **ney** û **nay**ê ku sema´î ne hemî*
Ji mehalat e bi ´eqlê xwe bizanî ji qiyas

Ey evîndar gava tu wan nîşan û dirûvên rastî û razên xwedayî yên ku bi rêya dengên alavên muzîkê yên mîna ney û nayê bi meqamê sema´î hatine bihîstin û guhdarîkirin, weha dibihîzî tu çu cudahî naxî nevbera wan alavan û ji xwe ne mimkin e ku tu bi hiş û pîvanê di maneya wan naxmeyan de bigihêyî.

Qanûn:
Zuhreçingê ev suwaj dî ew ji çeng avête çeng
*Xweş li pê qanûnê wê guh de tu **qanûn** û rebab*

Gelavêja reqqas ya çirisî gava şer û qirêna nav cihanê û ev bêrêkûpêkiya gerdûnê dît hima bi yek carê pergalên reqsê ji vî çengî avêt çengê û ew guhert meqamê newa yê kul û keder û xemgîniyê. Ey evîndar tu jî dev ji vê kêf û şahiyê berde û bide pey xemgînî û dilbikuliya Gelavêjê û guhê xwe bide awazên qanûn û kemaçeyê yên xemxwar û keserbaz.

Ribab/rebab:
Lew di çengê me dixwînî ku di ´işqa te bi saz
*Me bi bejna te dixwînin ney û qanûn û **rebab***

Vexwendin û ezimandina me bi awazên çengê û bi dengê peywengên din yên mîna ney û qanûn û ribabê bi bal evîna te ve ji bo dîtina bejna te ya nazenîn û dilruba ye.

Rûd/Saz:
*Suhbet bi **sazan** hate saz pê mewwicî deryayê raz*
Da dil ji nû bayê mecaz wê keştiyê sukkan e reqs

Bi alavên muzîkê yên sazîn civat û suhbet hat gerandin/sazkirin û pê re jî pêlên deryaya razan rabûn û li dil da ku bi wan pêlan re bayê evîna mecazî jî xwe gihand dil û lengerê keştiya wî ji cihê xwe ferqizî û rabû reqsê.

Ku Katib dêmê cedwel kit şikestexet muselsel kit
Ji yek herfan mufessel kit kî ye vê muşkilê hel kit
*Dizanî **rûd** û '**ûd** ewwel çi tavêtin surûd ewwel*
Ke 'işq asan nimûd ewwel we lê uftad-i muşkilha(ji bo manayê li jêr binêre!)

Tenbûr:
Mehbûb xwe nîşan da sefê carek di cama qerqefê
*Hatî bi awazê defê **tenbûr** û çengê nexme da*

Gava dildarê di rêza govendê de û di nav piyaleya şerabê de carekê xwe nîşan da hingê di cih de tenbûrê jî di gel def û çengê dest bi awaz û ahengên muzîkê kir û lorand.

´Ûd:
Ku Katib dêmê cedwel kit şikestexet muselsel kit
Ji yek herfan mufessel kit kî ye vê muşkilê hel kit
*Dizanî **rûd** û '**ûd** ewwel çi tavêtin surûd ewwel*
Ke 'işq asan nimûd ewwel we lê uftad-i muşkilha

Dema nivîskarê qudretê ruyê dildarê bi gulang û kagulên bi ser hev şikestî ve xemiland, ew li pey hev rêz kirin û bisko bisko ji hev veqetandin, gelo ew kîjanpispor e ku vê gelşa zor û tevlîhev û vê mamika xerbilî ji hev derîne û şirove bike. Na ji bilî wî Aferînendeyê hêzdar kesî din nikare. Ey dengbêj ma tu dizanî gelo rûd 'ûd serê pêşî dema distiran çi deng û awazan derdixistin? Wan digot: "Evîn serê pêşî hêsa û xweş bû, ew ji hevdîtin û lihevnihêrtineke xweser û besît derket holê, lê dû re ji evîndarê reben re bû zehmetî û tadeyiyeke zor ku digiha kêrta mirinê.

Zengil (ceres):
Cana ceres û rehberê/rehrewê 'işqa te ez im qet
Ageh bi fixan û herekatê ceres î tu

Ey dildar û cana min ez zengilê stuyê dewara pêşiya karwanî me û rêşînasê rêya evîn û dildariyê me da rêberiya rê bikim û riya rast nîşanî

evîndar û bengiyan bidim ku nekevin ser riya şaş û winda nebin. Lê ez nizanim gelo qet haya te ji hawar û qîreqîr û lebta vî zengilî heye ku çiqas tade û eziyet dikêşe û çendî hewceyî dilovanî û henûniyê ye.

*Gavek ji dengê **zengilan** êmin çi rûnîn menzilan*
Hey hey dibînin mehmilan feryad e her qentarê çerx

Gava em dibînin ku wa kerwanê rêwiyan herdem di rê de bi kefteleft digere û qîrewîra dengê zengilê wan e bi meqam û ahenga zengûle feryad û fîxan dike, em ê çawa yek kêlîkekê jî karibin di mehafeyan de rûnin û weke tişt nebûbe li cihê xwe rawestin.

---

[13] Îzeddîn Mustefa Resûl, *Melayê Cizîrî Şitek Derbareyê Jiyan û Berhemî*, Wezareta Perwerdê/Zanîngeha Selaheddîn, 1990, Hewlêr, r. 11-12 ku ji Qenatê Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurdî, Roja Nû, 1983, Stockholm, c. 1, r. 91-93; Celadet Bedirxan, Hawar, hejmar 26.
[14]M. Nesîm Doru, b. n. r. 88-89
[15]Bnr. Ebd us-Selam Nacî Cizîrî, Şerha Dîwana Şêxê Cizîrî, Spirez, 2004, Dihok, honrawe 31
[16]Bnr. M. M. Zivingî, b. n. qesîde 114.
[17]Bnr. Zivingî, b. n. qesîdeya 59an ya "Ey şahidê qudsî".
[18]Bnr. Zivingî, b. n. qesîde 95: Ey şahidê qudsî
[19]. Ji bo berfirehî li ser van desgah û meqaman bnr. H. Mem, Behrûz Rezaî, *Muzîka Seraya Kurdî*, Imaj Matbaacılık, 2007, cih nîne; *Sufism Music and Society in Turkey and The middle East*, Swedish Research Institute, Stanbol, 2001, wergera ji frensî Sylvia Zeybekoğlu, r. 149-160; *Osmanlı Türk muziği Ontolojisi*, Lalezar Topluluğu, Kültür A. Ş., Istanbul, n. d., r. 13-40, (ji arşîva mamoste Lutfî Baksi); Mehrdad R. Izady, *Bir El Kitabi Kürtler*, Doz yayınları, 2007, Istanbul, wergera Cemal Atila, çap 7, r. 426-430.